PERÎŞAN

# ŞÎN Û XEBAT

DÎWANA ①

WEŞANÊN BERFÎN - BERFÎN VERLAG

# PEŞGOTIN


Ez dibînim û wisa jî dibêjim kû kesên nivîskar û şaîr û hunermend ewin yên kû xebatek hêja û bilind ji miletê xwere dikin û serê miletê xwe bilind dikin û hildidin jor ev xebata ji vî rengî nivîsandin û hiner xebateke pir hêja û giring û giran bûhaye û ji rengê herî bilinde.

Nivîskar û şaîr û hunermend ewin yên kû bi kûrîtî û bi ferehî li ser dîrok û mîjiwa miletê xwe disekinin û bi ferehî jî li ser pê mayê miletê xwe dinivîsin û ev nivîsandin û hiner bihezarê salan li nav rûpelê mîjiwê de.

Li demên direj de dimînin û nifşek didê dest nifşekî û filiklor û mijwa miletê xwe bihemo miletên cîhaêre didin naskirin dizanin kû ev nivîskar û hinermend dibin rohnîyek pir bişewq li ber milatan û dibin tevdanek pir bi hiner û xurt di nav miletan de û dibin rêçek pir fereh ber tevger û rêxistinên miletan û li bermiletan rêvedikê.Herî tê te xuyanî kirin kû rist, şir û hilbest kalema çavê neyarin ji lewra dibejin ev xebata kû ji vî rengî xebateke helî bilinde û bi romete.

Gelek caran bimin rehatiye xuya kirin kû kesên nivîskar û şair û hinermend dilovan û dilpak û paqijin û xwedî bîr û bawerîne ji ber vê yekê ez sipasîya hemî kesên nivîskar û şair û hinermandan dikim û di nav wande jî sipasî nivîskarê hêja û bilind / Kamîran/ dikim û serkeftin û pêşveçûne jêre dixwazim ji ber kû ristevanê minî Kamîran rêçekzanistî û hêja girtiye û têde gelek ristên xweş û hêja çêkirine û binezmek wek hevî hûnandine hêvîdarim kû ristevanê me divê rêçê de bi dûmînê û roj bi roj têde xurttir û ferehtir binivîsîne û bibê şaîrek mezin û payedar û dinav ristevanên miletê xwede cîh bigre û dinav gelê xwede nav û dengekî bilind bistînê.

S.K.



## ZOR DESTAN DİHÊRİM

Pizot û pêt û arim ez
Şewat û kêferatim
Çeleng û xurte mêrin ez
Kuhû pût û kelatim
        Rewanê serfirazîme
Agid û baz û şerim ez
Bi mêranî bi dengim
Pilingê ser zinarim ez
Ji rengê Areratim
        Jîyan û restegarîme
Dûrbîna rojhilatim ez
Kûrdim gelek dilêrim
Heta va serbestîme ez
Zordestan xweş dihêrim
        Neyare şew û tarîme

## ŞÊRÎNE WELATÊ MİN

Welatê min çi pir şeng û şêrîne
Ji bona min jîyan û hingivîne
Buhuştê ew gelek bi xêz û xemle
Tijî derî û bazd û melayîne
Belê kindal û kort û xêd û çale
Ji av û co û cobarê zivîne
Li dor wê êmiş û mêwû fêkiye
Di hindir de koh û hêrik zêrîne
Dijîn tê de gelek koşkin ji yaqût
Gelek jê xar û zivinga kirîne
Ferat û xabur û him çemê zabê
Di nêv singê welatê min civîne
Bi paxir û petrolê bi denge
Ji dû lêvên wê cewher afirîne
Ji dû deman gûlav û misk û anber
Cîhan têkde vê sor gulê dibîne
Tijî dehl û şînayê renge rengin
Bi şîn û keske sorê xemilîne
Mixabin kû dinêv pencê neyare
Segê haran kokê min jê birîne
Qeşeng û naz û şengî ew bela bû
Ji lewra sorgula min dilbirîne

## AŞTÎ

Rewanê jînê
Xweşi û şadî
Dewleta evîn
Govend û nadî
        Şewata nînê
        Berat û xebat
        Tevgera hînê
        Goven û civat
Sersal û Newroz
Cejin û ronahî
Dawxazî û himdoz
Felat û şahî
        Devlet û hebûn
        Taca serê min
        Nama serxwebûn
        Ya hêvîyê min

Dijminê neyar
Kevoka biper
Xama bi biryar
Bê çeng û bê şer
        Dadî adalet
        Rista wek hêvî
        Alav û şewket
        Ji zêr û zevî
Şabûna jînê
Bê kuştin û şer
Baxê avînê
Bê kul û keser
        Bo çi windaye
        Maye bê ardû
        Îro neşaye
        Li kuye avrû

Li ser te neyar
Bi lic û xurtin
Heval bendûyar
Hatin guhertin
        Bi lez bi çine
        Tovê şaxê xwe
        Da kû bigînê
        Min hêvîyê xwe
Hezar salin em
Ji te bi gazin
Tim horiyête
Em pir dixwazin
        Serte bişîne
        Kulê derdê min
        Bê te mirîne
        Kokê rihê min

Serê xwe rake
Xurt bib xuyanî
Ji xwe rake
Dîlî beyanî
        Kelha koledar
        Bid ber talanî
        Rengê sitemkar
        Bid ber halanê
Herkes dibêjî
Di dewleta xwe
Kesra nehêjê
Kes bi zora xwe
        Bela bijîn Kurd
        Serbest û azad
        Nemînin zigurd
        Ji xelkên berbad

Welat avakin
Hemî jin û mêr
Dilê xwe şakin
Tev piling û şêr
        Bibin yek perçe
        Gul û gulîstan
        Ne hov û sirçe
        Nemînin awan
Buhuşta meye
Bijî tê de jîn
Xebata meye
Rewşa Mem û Zîn

## PARA ME XOZE

Timî para me xoze
Timî para me jare
Berdij mînan Newroze
Pîrozek bêji mare
Diyare bo me doje
Ji ferman û qirare
Dost û yara me boze
Me daye des neyare
Ger û dewra me bende
Li ser me kund diwxîne
Me tuneye tu dewlet
Di pertûka hebûnê
Ziha û him derinde
Jime dinoşê xwîne

Bi tevdîr û sîyaset
Diçêrin ser birînê
Li ser me tim hejarî
Li ser me îro şîne
Ji bo me restegarî
Kul û derd û birîne
Bo dijmin û neyarî
Jiyan û hingivîne
Gerdûn wisa biwxarî
Heya kengî bimîne

# NALÎNA MİN

Dinalim ez şev û rojan
Dikim hewar dikim gazî
Ji ber azarê wan dojan
Dixwazim kû bibim buryan
Dem û çaxê me tev korin
Ji rengî têrnabin razî
Bê hêvî û bê aburîn
Xwe dikin arpêjê guryan
Jê xuyanek û tev şîne
Tu car nabînê efrazî
Bi kul û keder û kîne
Dibe jana dilê gîyan
Xebatê tû dike winda
Ji vînê tû pêrîşani
Melûlî daye ser finda
Bê pişk maye ji tejiyan

Dil sar û pişt şıksestîye
        Nabînê çir tû kamîran
Ne poz bilindî mestîye
        Bi serde tû bûye duryan
Dixwazim kû şevê rakim
        Sitem dahew bê Ahrîman
Kokê evînê belav bikim
        Nehêlim van beşê Awran

## SERHİLDAN

Zaxo bilîlin
Roj va didê der
Li xelkên welat
Bûye ronahî
Nemane di dilde
Axîn û keser
Mizgînî xweştê
Tevbûye şahî
Tor û dek û ben
Sitema neyar
Bêhûde bûne
Şevên anî beş
Di çin dir evin
Pêlang û bêtar
Xwedane dorhev
Lêbune ateş

Li wan bûye şev
        Hewar û qerim
Serî tewandin
        Kesên bê Avrû
Ev Omidahan
        Ji mir dibu kîn
Ê dî Kurdistan
        Hewdibê Ardû

## NAMA MİLET

Miletê min pir nezane
Jar û bindest û xizane
Navpî û destê dizane
Nişana tîrên neyar
Nîçîra zor û zîyane
Ji welatê xwe beyane
Bêheval û bê xudane
Sed aman û sed hewar
Di şer û pevçûn û cenga
Pir bi nav û pir bi denge
Bi mêranî pir çelenge
Çawa mane bendewar
Kokê sextîyê mirandîn
Çakî û dadî gerandin
Dewlet û war afirandin
Xwe hêlane şermezer
Ev ne texmîn û gomane
Nejî xewnek sermeyane
Ser û ber tevde xuyane
Jê dibare tim zirar

## ŞERÊ XWÎNXWAR

Dijminê însan
        Dijminê jînê
Kokê impiryal
        Hevalê nînê
Rêjîma behsî
        Erebên xedar
Li ser medanin
        Ev ben û zinar
Mal û milkên me
        Hiştin bê mikûs
Gelek ji Kurdan
        Hiştin bê nifûs
Şehr û gunden me
        Anînê Areb
Talan berdan ser
        Bê suc û sebeb
Bûne li dinê
        Şewat û tofan
Ji bome çandin
        Vebrin û talan
Dane gerandin
        Zinat û sitem
Karê waye tim
        Îş û derd û xem
Ji wan dibare
        Zîyan û zirars
Faşîne faşî
        Arebên xwînwxwar

## WELATÊ MİN MELÛLE

Delala min çima herdem dinalê
Tipir şox û gelek şeng û delalî
Tixweş jînî ji bo Kurdan seraser
Di cîhanê buha zêr û liwalî
Qeşengit û ji rengê dayîkame
Di dilde tû dilê dil û cemalî
Ji bo doza dilê te min didî bo
Hezar tixmêzinat û taleşarî
Hezar rengê şewat û bobelatan
Li Qamişlo li hisi çe dibarî
Di rêça Kurd û Kurdistan dibuye
Kelem û xarêjîn û ristegarî
Belê min jê gelek fixan didîbo
Tim û tim şîn diposîtarûmarî
Bese êdî bese edî melûlî
Bese giryan ji her alî bibarî
Wisa nabit li ser me darê dijmin
Divê bimrê tev dîra koledarî
Welatê min dê serbest û azabê
Camê levxin keleh şîn û hegarî
Milet rabê bi şer û cengahalan
Namîne qet sitembarî hejarî

## KENGÎ

Kengî emê dil xweş bijîn
Derbin ji bin destê neyar
Koh û kelat serxweş bibin
Bişkînin qîdûhim zinar
Canê me bê kuştin û şer
Bijî serxweş û payedar
Serbest bixwînin mêr û jin
Behsî nema bibin siwar
Destûr û qanûna welat
Xurtî bide bi rengê baz
Sorgul di baxa geş bibin
Bilbil bidê sed reng awaz
Bi partî û şewket û tac
Bi çarû hêvî û neyaz
Zîndan û bend qettinebin
Doza welat bêt serfiraz

## JI BİZAVA YARTÊ AFİRANDİN

Ditariya jariyê
            Bi pepûkî diroşim
Dibin ewrên pariyê
            Bişînê xwe dipoşim
Di nêvpêtê arîyê
            Tala jahrê dinoşim
Bêtevger û bê xizmet
            Em wiha tev dijînin
Bê şadî û bê dewlet
            Xarû xipadi çînin
Bindarê zor û minet
            Bi dilsarî dimînin
Jengî lihiş digerê
            Lew ber dane nezanî

Pendî carek naçêrê
        Rêdaye dest xizanî
Tû bê hêvî dinêrê
        Bi temabû ziyanî
Sed pêlang û fût û fêr
        Serme hatin gerandin
Himdijûn û xeşm û çêr
        Doza medan mirandin
Nexuyabû baz û şêr
        Dadî hat gurandin
Layên kasî û kardox
        Xaka xwe tev berdane
Mane bê nîşa û tox
        Av û kura derdane
Me nenasî bo ya zox
        Di îro pir arzane
Gernekin kar nerabin
        Dê tim bindest û dîlbin
Ne dilxweş û neşabin
        Tole û tim abid bin
Bê nerx û bê bûha bin
        Di nêvpen cêxwezî bin
Pêlan bidin xwerabin
        Dê em şermê hilînin
Tar û jengîya şînê
        Têxin gorê bimrînin

Nemînin bendê kînê
        Dano jînê bibînin
Ber zinarên jidoja
        Berî bidin xebatê
Dikê Ferat ê soja
        Xwe bighînin Felatê
Nebînin kalê roja
        Zû bişkînin şewatê
Divê serbest xûyabê
        Dadi bizava bijî
Bi daxwaz û devabê
        Ji bo min xwe bikujî
Tû ne wihabê nabê
        Tûcar lêva namijî
Yarateme delalim
        Bête ez bê bûhame
Ji rometî dinalim
        Nêçîra çarzihame
Zêr û dur û li walim
        Şewqatav û çirame

## XURTÎYA YEKÎTÎYÊ

Ta nebin yek mê bimînin
        Dîl û bindestâreben
Wê li ser mebê gerandin
        Fût û fêr û dekûben
Wê daxwaza me bimînê
        Bê yekîtî bê bûha
Ser li jêr gorê bibînê
        Çeng şikestî em wiha
Nagihin xelkên cîhanê
        Nagihin kesî bi deng
Nê çira zor û zîyanê
        Ger bikin volqan ji ceng
Bê daxwaz û dê bimînin
        Pîr û puç û jevketî
Nayê dst me tû jîyan
        Ne hêvîyên qetqotî

Çîroka xelkê bimînin
Qelsû bêkar û betal
Yar û eşq jêtê revandin
Dûr û yaqût û liwal
Lîstika dijmin dimînin
Dehl û xakên di buhuşt
Me bi destê xwî zirarî
Ji xwe dorxistî surişt
Bib neyek berdin şewatê
Mêr û jin tevlek bilek
Rê nedin xeşm û zinatê
Dabijin em tev melek

## HÊVÎ Û AVRÛ

Tênê bo min tu xemgînî
Ti dilsar û timî şînî
Bê aram û bi yazuxe
Ne ti rewşe bêmizgînî
Hemî tewşe çiqas zuxe
Bişîne bendê bêhoşî
Gelek dînî di ser xuşî
Biratî wêne kêraman
Giyanê xwe ti dinoşî
Nebe mij û nebe moran
Eger carek nebê findî
Nebê romet ne bê rindî
Xebatê tu nexê dilde
Dizanin kû tireş kundîn.
Ji ser te avruyê firde

## ŞÊRÎNE MİN

Şerîn û şeng û naza min
Dûr û yaqut û lala min
Şepalû şox û ala min
Rewan û rûh û balamin
        Gelek serte dinalim ez
Hetav û şewq û tava min
Çinar û mûm û finda min
Sitêr û hîv û raja min
Didinê pşk û para min
        Gelek zorak ûbigrim ez
Rîhan û misk û gula min
Enber gulyaz û sura min
Mircan û mor û sema min
Sersal û cejin û aîda min
        Gelek serte dinalim ez

## JÎ XEW RABE

Herê Kurdo
        Timaye bê kes û cî
Diwarê xwed
        Dimaye jar û birçî
Maye lîstok
        Dibindê tar û marî
Timî serte
        Di çêrêj jeng û tarî
Bi mînê ber
        Fen û fûteê neyara
Gelek bote
        Fihêt û şer mûara
Xwe xist bendê
        Neyarê xwe deranî

Ji dîroka xwe
Îro mabeyanî
Eve mestî
Eve jarî nezanî
Eve gêjî
Eve dîlî xizanî
Belê ya tû
Ji bona xwe fidakir
Eve ye tû
Ji yara tecidakir
Hewar Kurdo
Heya kengî gedabê
Ji xew rabe
Da serbestî xuyabê

## ÇİRAYA ÇAKİYÊ MESTE

Bê dewlet û hebûnim
Bê tac û xac û alim
Li benda serxwebûnim
Îro rapîr û kalim
Tovê jînê di çînim
Direngê xûz û dalim
Çiraya hêvîya min
Heval û sêwiyê min
Ji bo min êş û taye
Çakîya dadîya min
Bê nerx û bê bûhaye

Li ber dijmin dironim
Bê çar û bê debarim
Bê daxwaz tim dikonim
Kal û derd û hewarim
Bi mîj û bi ristim
Çira dorim jinadî
Tenê pênûs û xamin
Ji bo dîlan û şadî
Didin yê jar û mestim
Divê jîna ne dadî

## DÎLAN Û SEMA

Jîna giyana hat kirîn
Zor û zinat wê bêbirîn
Rizgarîyê şewqa xweda
Gel û milet tev raperin
Rojek pîroz bûbû xuya
Sersal û cejna mîdîya
Herifi kelha bê kûta
Piştî tajanê hêvîya
Herkes bi cama şadibin
Bilbil di baxa jîn dibin
Ferhad û Mem hatin sema
Saz û awaz pir hildibin
Bûhar û sersala dile
Sorgul di bala bilbile

Agir liher alî gure
Pîroz ji zêranî hila
Jiyan ji xwînê bû evîn
Bendê di destan deşikîn
Zêranîne şewqa xwe da
Bajar û gund tev xemilîn
Koh û gelî têser xweşîn
Çax û demê dewrê xweşîn
Kul û derdê di dil nema
Lewra çinar û mûm geşîn

## REWŞA ZAROYÊ DEHBÊ

Miletê min dan şewatê
Dîl û him winda kirin
Dorî jîyan û beratê
Gel nezan û korkirin
Himberî kar û xebatê
Wisa embin destkirin
Dane dest hev ew bilind bûn
Doz kirin wek dam û gok
Bi qûnax û war û cîbûn
Bin me birîn qurm û kôk
Ew bi mêjî pir çeleng bûn
Lew nedan me rêç û rok
Bo cihê xwe pir ditirsin
Bo navê xwe têne kar

Qet ji bo me ewna pirsin
Her me dikin tar û mar
Ji xwîna gelê me girsin
Ewin destarê neyar
Xweş xuyane kû gelê ywe
Dan firotin bê bûha
Dar û bistan û rezên xwe
Dane des hov û ziha
Dayik û xuşk û keçên xwe
Jêre xistin nav ciha
Mane bê namûs û avrû
Ma namûs ba wa çiye
Bûne Paşa bûne Axa
Tev li ser me birçiya
Gel kirin tine û winda
Tev ji bona kursiya

ÊRÎŞA XEDAR

Çi êrîşek xedare
Bê ol û bê debare
Li koşk û koh û xara
Li ser gund û bajare
Tev kuştin û wêrane
Tev kovan û vebrîne
Bê sînor û berave
Ji bo jîna me şîne
Dijminê bax û bistan
Li meydanê qirarin
Ji bo dîl û bin destan
Faşîst û koledarin
Berê top û tifingan
Li sorgulajîyane
Şewat û ar û burkan
Ji tev dîra torane

Li başur her dibarê
Zirar^u kolebarî
Bi destê pîs û berber
Sitema şew û tarî
Kurdo xweş guh biderê
Livê êrî şûxarê
Çi dozê ew didêrin
Di çar dihê ayarê
Nehêlindoz û dava
Neyarê we bici bê
Bişkînin doz û dava
Da serbestî xwe dîbê
Çi qas dara serbestî
Bahoz liser bibarê
Xurt dibê jîn peristî
Himber gor û temarê

## CEJNA JÎNÊ

Va sema û fidtevala
Tên semayê bo jinê
Pir dikin bi xêr û pîroz
Vê govend û cejinê
Pir pîrozbê pir pîrozbê
Ev roja bişewq û geş
Li neyara ar û doj bê
Şadiyawan çavê reş
Roja serbestî û jînê
Roja xweşî û felat
Cegihê hîn û hebûnê
Kungira jîn û xebat
Bo jinên cîhanê tevde
Ev ro dîlan û sema

Hat hilanîn zor û şevreş
		Derdê buryana nema
Bend û zincîr tê şîkandin
		Wan jinên şêr û leheng
Xwîna canê xwe rijandin
		Bûne azad tev çeleng
Pir pîrozbê, pir pîrozbê
		Şadî û cejna jînê
Pir pîrozbê, timî dozbê
		Li xwişk û zend hesinê
Ev ro gelkî pir delale
		Pir bi rewş û dadiye
Tav û tîrê jû hilale
		Tîrê ja azadîye

## NAMEK JÎ XAÎN RE

Heya kengî li tepîsîsi warbe
Tû dijminî ji bo Kurda seraser
Li dîroka te sed lehnet bibarê
Xaînê fen û fût û fêr û qeşmer
Ji roja rojde tû xoz û xedarî
Dijî partî dîsa kir kuştin û şer
Ji destê te dibarê tim gemarî
Tenî kiryari wê te qîza Çiler
Ti dovik û pî û teryê neyarî
Ji te tofan û lehî hatine der
Çi xwînmij û çi berberek beyanî
Ji Refsencanî re casûs û noker
Kirasek reş poşandî gund û jara
Ji ber jengiya karê tê bêtevger

Nehiştî kes bi dil şadî û xoşî
Timî qêrîn û nalê hindir û der
Tûne Kurdî nejî Kurda xuyanî
Tû hatîye afirandin ji çarder
Reş kundî tû li ser Kurdan dixwînê
Te Kurdistan xirakir tev ser û ber
Tû behsiyî, riya rast, olperestî
Ji boya wan buyî sirçe û himker
Lêzanî be tû gora xwedi kolê
Bivê karê xwe yê bê pask û bê per
Tiştê anî liser rewşa gelê min
Nikarin gunhê tera kin pêxember
Ber zanîne hemî Kurd kok û binyad
Heta hîm û kelata bûne leşker
Perîşanim divim serte bibêjim
Lê jêr divê hezar ferheng û defter

## XWEDYÊ AŞ BÛYE QERAŞ

Kurdo lixwe binêre
Çima îro li paşî
Dilbirîn û nexweşî
Ji bo dijmin qeraşî
Li te şerm û kirête
Ev dîlî û bê hoşî
Gera dinyê bighêre
Divêjêbighê başî
Xelkên dinê seraser
Neman wek te pêrîşan
Ne li hindir ne li der
Nexweş neman bê derman
Çiqas li te pepûkî
Buye pîda û arzan

Li te şerm û fihête
Are ji bo te ew can
Limî jiwan binêre
Gelek têde çelengî
Derdê xwe zû bidêre
Nehêle têde jengî
Ji alavek xuyanî
Tû xweş alav û dengî

## DÛBENDÎ HÊVÎYA KOLEDARE

Dinêv min gur dibê arê dûbendî
Çiqas aw baş û pîs û pir xedare
Neb û xewname carek dewlemendî
Gelek bo me fihêt û şerm û are
Bi sed rengî li me kir fût û fêran
Gel û milet linezanî siware
Neyarê min li ser min bû afendî
Ji bo arê dûbendî alîkare
Ewe yê ko bax û bistan talankir
Wêran berda goh û lat û zinare
Pêrîşanî li canê me siwarkir
Ev çiare xurte arek dijware

Bê nerx bûye buhayê hêvîya min
Ji lewra tim dikim qîr û heware
Bi sed bexî didê min kê feratê
Me ber daye şikeft û koh û xara
Ne dîtî min jivê jîn û xebatê
Tû nifşê sorgul û baxê buhara
Bese êdî jivê şer û dû bendî
Neyar û dijmin û him koledare

## FAŞİST NAMA

Sedam ê faşist
            Pîsê tewankar
Tepat û sotin
            Tev gund û bajar
Hatin zirandin
            Bite ev beşer
Nama te kuştin
            Karê te tim şer
Pir vebrîn û êş
            Te dan gerandin
Xuşiya te jîn
            Kûbê mirandin
Goh û dem û co
Bê zîn û havil

Koşkin dibuhişt
        Tekirne kavil
Roja te daye
        Rojek anî beş
Karê te sohtin
        Dîroka te reş
Xama te nohtin
        Talan û zîyan
Li ser me Kurdan
        Buye wek Yezdan
Bi zor û zinat
        Tajan û sergum
Gelek mêr û jin
        Di vê rêde çûn
Tikolonyalî
        Ziha û dêwe

Te dane kuştin
        Gelek wek zêwe
Ne nifşê dara
        Ne gulêsora
Ne tîr û telûr
        Tev çûne gora
Dijminê aştî
        Him serfirazî
Îro li dunyê
        Faşist û Nazî
Te afirandî
        Di dewra jînê
Kel hek jiqoqa
        Deryek ji xwînê

PÊLANG

Ne çax çaxe û ne rewş ^zîne
Hemî kovan û vebrîne
Bi destê rovî û sirçe
Di gel hirçê hiner xwîne
Li ser rewşa welatê min
Bi fen û dek û pêlane
Perwa û him xelatê min
Di sozê wande hêrane
Ji susmarê xuserîne
Neyarê gulşen û rojê
Bi tevger û bi civîne
Dadane agirê dojê
Deva û him mûrada min
Li ber tîrê devê kunde
Devaya kund û kovaye
Dîroka min bikin winda

## LÎSTOKA ŞERXWAZA

Cîhana tev xweş û nadî
Dijî tê sorgul û şadî
Tenê bome ne seyrane
Me nîne têhe qûdadî
Dinêv bend û dinêv xara
Li ber tîrê sitemkara
Timî amanc û nîşane
Êrîş û kuştin û xara
Çi wêran û çi talane
Çi ahrî man û sultane
Gelê min tora derdane
Timî ber bend û fermane
Çi zindan û çi zinare
Karê xwînmijan notine
Tazî û Turka dadane
Para me ar û kuştine

Wilo cîhan bila bimrê
Cîhanek nû li şûn bigrê
Kokê tazî û torana
Ji bin yada zeman bibrê
Wilo nû dem dibê sema
Cî namîne ji bo xema
Buhişt bê warê insana
Di her çax û di her dema
Mem û Zînê bi hev şabin
Beko ewan têris wabin
Bibin alav bibin sema
Azadîxwaz bi buhabin

## RİHÊ MİN BER ŞEWATE

Kelha felat û jînê
        Doza devya dilê min
Sersalê hingivînê
        Xama karê kulê min
Mixabin derd û kîne
        Diçêrê ser kihê min
Derya şewat û nînê
        Bi pelê derrihê min
Ser koxik û kadînê
        Rawestaya cihê min
Derya tîrê birçînê
        Xelek dane mihê min
Di dewra aşq û vînê
        Dilxwînin xwestyê min
Hêstir barîn ji xwînê
        Ji çavxan û manê min

## PEPÛKÎYA MİN DİJMİN DİÇÊRÎNÊ

Dilê min tev kal û êşe
Pepûk û jar û xem kêşe
Ji afrazî û xoşîye
Ne ti par û ne ti bêşe
Dibin şeva şew û tarî
Dibarin lê sitembarî
Nedîtî ji tûnoşiyê
Ti omid û alikarî
Dişer û rav û pevçûnê
Bidengin em digerdûnê
Ji bo doza neyarê xwe
Hebûna wa dihebûnê
Ji bo xwe jar û xemgînê
Kul û derda dibarîne
Ne zanepir direwşiyê
Neyarê xwe di çêrîne

## LÊVÊ RİZGARIYÊ DERMANE

Were carek jidûlêvan binoşim
Şerab û hingivê jîn û heyatê
Dikarîbim biser bestî biroşim
Bêrê xwe zû bidim jîn û felatê
Divim rizgar bikim xwe hew bipoşim
Kirasê şîn û hizin û kêfarêtê
Dû lêvên tejî bo min xweş jiyane
Ji ser min radikê şew û şewatê
Tûne dikê di dil derd û kovan
Dihêrîneê nifşê zor û zinatê
Were carek ji dûlêvan vexum ez
Mey û bada şekir jîn û heyatê
Ma çênte xweş kew û dax û dermane
Dimrînê ew rewanê bo belatê

## MİZGÎNÊ RAZÎ NEKÊ NABÊ

Bilav û ax û hewara
Bi firyad û bi afxana
Binalîn û bi kovana
Nebînê şeng û zêrînê
Gazî hêvî û omîda
Kesê bêhiş û sewdane
Eger mêxas û agidî
Xwe bighîn eriya jînê
Bivî karî bivî barî
Di mînê ber şek û tarî
Di mînê ser te tim jarî
Bi jîdixan û kadînê

Nedîtît û alîkarî
Diwarê xwendin û hînê
Ne hîv û roj û sitêrî
Te naxin bendê perwînê
Ji bo te ev gelek are
Fihêta şerm û kirêtê
Gelek xoz û gelek xwere
Nahêjê rometa zînê
Divê kût î xwe perwakê
Di dewra reste garide
Rih û canê xwe cidwakê
Durûya quta birjînê

Here govend û dîlanê
        Digel mem xwe bihejîne
Wekî Ferhad, wekî Şergo
        Xwe nû pispêre evînê
Keleha dadî û çakî
        Ta û kokê wê bibîne
Bixwazê tû xebata xwe
        Razî kehînê mizgînê

SORGULA GEŞ

Sêrî rake şox û şengê
Di gel min bes veke cengê
Delal û naz û qeşengê
Ji bo min mest û serxweşbe
Dûrin dêm porzerê zêrîn
Dû lêvin hingivê şêrin
Dixwazim ser bidin çêrîn
Dilê xwe da timî geşbê
Tenê xemla dijînêye
Belê jêrayê zînêyê
Fihêt û şerma dinêye
Her her târewan xweşbê
Sûr û şewqadi laleştû
Xezala dil bi ateş tû
Kûlîlk û sorgula geş tû
Suriş tabaxê laleş bê

ŞÎNA HELEBÇE

Sala heştê û heştan
Digel nihsed û hezar
Salek rûreş û tarî
Lime dib û pêt û ar
Xeşm û zor û neyarî
Têde serê xwe hilda
Ji zinat û xwînxwarî
Bexdad çavê xwe kilda
Laleş û mizgeft û dêr
Dirsar û dilbirînin
Hêl û tarên di bajêr
Bi firyad û girînin
Tevna zordest û faşî
Cama dilê xwe şakir
Sersal û geşt û newroz
Vebrîn li xwe siwarkir

Divê rêde hemî çûn
Hatin birîn kok û rih
Bi hezaran mêr û jin
Kal û zêçên bê gunuh
Bi xerdel û napalan
Êrîş berdan Helebçe
Dehl û dar û kelatan
Dilkir neper çeperçe
Li cildana belabûn
Kelaşen kuştîya tev
Çav ji xweînê ziwabûn
Ji vê jînê nîne rev
Rîjîma kevne perist
Nîne jêr dost û heval
Vebrînan ser Helebçe
Anîne şehrê xurmal

Gelek komel û civîn
Darxistin vê pertukê
Bûne alav û nîşan
Li seranya dîrokê
Metijîye ji bara
Divê dewr û tewatê
Tahêvîme bernadin
Ji tora kêferatê
Felek bome zigurde
Li her qunax û taxa
Eve dewra me kurda
Ji her alî bi daxa

## ZİNARA AREBÎ

Ez tenê nêv xelkê dunyê
Bê nifûs û acnebî
Tim beyan maf û pepûkim
Mame bê dost û xwedî
Çi jîyan wisa dimaye
Bê romet û bê fedî
Qî gelo rast û rewaye
Kû bo min ti cî nebî
Her ziyanser me digêrê
Talî ser min firdidî
Nabê qet tû carî nebê
Ger binê min qut bibê

Ev çi serdar û seroke
Çi zihaye heî gidî
Nav dilê min dedi çînê
Vê zinara Arebî
Dijminê mafê mirove
Gor ne başê kes nedî
Koledarre, na^zikare
Dijminê qada mine
Nabê pêr dost û hevalî
Xwînmijê doza mine
Fixan û derdê welatî
Para hevra zêmine

## REWŞA HÊLEKÊ JI KURDISTAN

Ro bi şewq û geş û tave
Sura xwe daye cîhan
Dem buhar misk û gulave
Bêna xweş daye deran
Min dixwest herdem wihabê
Dor û hawîr niştiman
Dehl û dar gewher xuyabê
Şox û şenga her cîhan
Baxekî tîbet xuyaye
Jê dibarê hizin û şan
Roj û alav û çiaye
Day û xwişka bilbilan

Ez dinav vî baxî şabûm
Jê dibûme toravan
Min nasî jê şox û şengî
Qet nebûn wek wêxûyan
Têde şah û sermeyanim
Xwe dibînim Kamîran
Xweş li vî baxîra westam
Çûm û hatim sergiyan
Xam û pertûk min bidestim
Pesn î wesfê sorgulan
Bilbilek têde biriste
Pirdikê qîr û fîxan
Pir mexweş û jar û meste
Rû bi jorî asîman

Bûbû kul kûjê binasim
Bo çi evşîn û aman
Min digo besbilê jar
Besbike ax û halan
Derwelat û agihê min
Nabê şîn bûti kulan
Ka bibêje pir dixwazim
Ez biansim nav dilan
Belkî derdê te binasim
Bo te peydakim jiyan
Herkesî dîlan vedaye
Tû tenê jê perîşan
Gotî îro bend û şîne
Ji zirara bahsiyan

Li hisi çe pat û kîne
Cejin û eyda faşiyan
Xort û mêrên kurdumanî
Yên bi navê hebsiyan
Dane berpat û şewatê
Ev mirov û ev zeman
Ne ji îro ve wisaye
Pir dirêje ev ziyan
Xort û qîzê min didane
Dorî xam û medresan
Wisa sînema Qamişlo
Kirne gora zariwan
Ev çi tevdîr û çi kare
Eve karê taziyan

Min divet kû hew xuya bê
Nifş û rengê sêwiyan
Miletê min bi buhabê
Di buhuşt û di cinan
Hêf û tola wan nebînim
Bê debar û bê xudan
Hingî ez pê xweş û şabim
Nav der û koma gulan
Bese fîxan, bese zarî
Bilbilê dîl û nezan
Kes namînê dihejarî
Tim pepûk û binpiyan
Eve şana alîkarî
Bû felat û niştiman

Her bijîn û restegarî
Gor û dawiya duizan
Behsîtêde sernexunbin
Bibne roreş di cîhan
Piştî şew şeva tarî
Ro bixurtî tê xuyan
Ev sitem û zor û kuştin
Pat û tofan û tajan
Ez û tedê tê deşabin
Her ne nav baxê cinan
Qamişlo dê kilkê çava
Hisi çe kir ye dilan

## AX Û HEWAR

Dem bi tahlî tê
        Tînê nexweşî
Jîyan mirîtê
        Bê vîn û xweşî
Ew nîv kuştîtê
        Ji bê qudoşî
Dost û yarê me
        Tev bûne neyar
Bav û kalê me
        Bê çar û biryar
Bar û karê me
        Maye bê debar
Diçim ta dawi
        Li dov gula xwe
Dibûme bawi
        Ji hinêra xwe
Mixabin kawî
        Digrîm sura xwe

Ka ew dema xweş
Ew geft û dîlan
Ew çarika reş
Her qîr û halan
Nema dike meş
Di soz û pîman
Di her cî û gav
Em têne kuştin
Ev bendik û dav
Li me bi piştin
Kû ne kirin rav
Ji me nehîştin
Jîyan keleş tê
Para me şore
Li xelqê xweş tê
Ji bo me şore
Ka ba me beşte
Nanê me kore

## JİYANA NEXWEŞ ME NAVÊ

Dewr û gera me
        Tim li ser bela
Rast û çep diçim
        Li dov mi xela
Rengê benda me
        Îro beyanim
Di nav hirça me
        Kor û nezanim
Li ser dilê me
        Jînek pir şore
Di nav desta me
        Bi xweşm ûzore
Ji wê tor û rist
        Her dem dinalin
Harbin yan jî mist
        Car cara lalin
Ber dergehê min
        Ar û şewate
Tim jê para min
        Didinê pate

Tirsa min dawî
Nekê tû mizgîn
Her bi wî hawî
Bidê derd û şîn
Destê me tînê
Nadê me hêvî
Piş kek ji hînê
Ne jî ji nêvî
Dinêv nexweşbim
Bila bimrê jîn
Pêne serxoşbim
Çi hêjaye vîn
Bijî bend û tor
Kûtê de xuş bim
Herdem wiha zor
Kû pê binoşbim

## XERÎBÎ Û RENGE JÎYANA MIN

Îro limin çerx gerîya
Cama dilê min şikiya
Dîcle bi fîxan û hewar
Çerxa felek çep sorya
Dorbûm ji dîlan û sema
Dewlemendî rawestiya
Xwehrî û xozî ya dema
Bi ser min de hilweşîya
Pora serê min kir sipî
Ji bê omîd û hêviya
Ana di nav pencê xwezî
Xwezî bi gava buriya
Buryan dibêt aca xebat
Xortaniyê koç birya
Bê çizî bûye kêferat
Dava xwe ser min girtiye
Kaba min beştê her wiha
Mîrkab nemandî bê xuya
Nanê me kor buye diyar
Bextê me reş wek şevya
Para me buye pîr û kal
Bacv û hevalê sêwiya

Pişkamî buye tal û jar
Ev tev destpêka dawiya
Nîşan û remza serxwebûn
Ji nêv xeyalan reviya
Bûme heval û dost û yar
Kor û seqet û bawiya
Nana mena bînin debar
Heta ew rengê taliya
Îro şepirze û hejar
Şînê li min şîn girtiye
Beyan û dorî dewletim
Xerîbim ez livan çîya
Car car birçî î tazîyim
Carna diya min rusiya
Her otv rengê kêferat
Jîna min tim reş tê xuya
Nagîjê min doz û mûrad
Li xelkan şîr û xoşîya
Ber hev dikim çakî û dad
Şensê min şona hestiya

## BAXE MIN BU XAR

Dîsa gula min çilmisî
Rist û tore min man tisî
Xifşa xezalê melisî
Pir gazî û ah û aman
Ez girtiyê bê bendexan
Vîna teye cenga giran
Dîlber bese kengî debar
Bilbil bi fîxan û hewar
Nehim ber êriş û şerim
Ez pakrewanê bê berim
Bi derd û êş û kederim
Ew şerm û kirêt û fedî
Kevoka ser jor û kedî
Tim tim dimînê sermedî
Baxê dilê min bûye xar
Bilbil bi fîxan û hewar
Îro çira nabê şiyar
Ji Kurdistana bê heval
Ya îro maye bê xeyal
Pişka wê ye tim kal û tal
Ew pilingê li ser çîyan
Li dov te ketne van riyan
We kî te mane bin piyan

Mişhet û dîl û pir hejar
Çerxa felek ev kir diyar
Dîlber heya kengî debar
Ew xama lal û bê mecal
Ew geft û murcan û liwal
Ew şûq û alav û şemal
Yê jê birin kok û rewan
Destê ji pert û kê beyan
Kû li hisî çêbu xuyan
Li qamîşlo şîn û hewar
Rengê amûdê kir diyar
Baxê dilê min kirye xar
Gelo kî wek me bê nifûs
Her cegerê têr kêr û mûs
Ez mêjiyê dibin zinar
Behsîne dijmin û xedar
Li ezmanê me bi temar
Tenê mam mişhet û hejar
Diwarê xwed bê cî û war
Dilber heya kengî debar

## JÎNA ALA MIN

Şewat û pat û tofan
Sîtem barî nexweşî
Kul û derdê perîşan
Le ser min xwe diposî
Di her gav û her zeman
Xuyaye bê qidoşî
Cerg û hinav tên sotin
Bi destê turk û tazî
Xwîna dilê min notin
Firs û nexweşê nazî
Nabê ser min tim tofan
Hêvî me ser firazî
Ew bend û pîman û soz
Her qerarên bê avr û
Ji bo me dadidin doj
Bi xar û xuz û ardû
Li wan dibêtin pîroz

Neqiş û xuna vê cadû
Namirin pê doza min
Nayê kuştin ta cara
Tim şahdibê roja min
Bi sed rengî dubara
Nabê tune riya min
Bi pîman û hewara
Tim tim baxê min şîne
Dijmin pişt kul û xoze
Tola min tim bi xwîne
Li me herdem Newroze
Şewq û ala min jîne
Sed pîroz û pîroze

## DESTURA XOZ

Welatê min hezar salan bindeste
Perîşan û gelek xemgîn û jare
Şev û rojan di hindir şer û cenge
Şîn û giryan tim û tim lê sîware
Ji çar hêlan sirgûn û kuştin û xwîn
Zindan û bend û zincîr her diyare
Şewat û talan û wêran û tofan
Li ez manê welatê min şîyare
Nedîtî min tirew şamiletêdin
Neti dewlet bi vî rengê temare
Perîşane gel û him dewleta min
Melûle tim ji van pîlang û xare
Nizanim ev çi destore ji bo min
Çi qanûne li ser min tim bi çare

EM KURDIN

Em Kurdin Kurdin Kurdin
Xemil û rewşa çiyane
Mêr û merd û çelengin
Bi qîmet û bûhane
Taca serê gelanin
Çavê neyar de tîrin
Him berî fût û zincîrin
Tor û bend û fêran
Di jînê de fenerin
Koledaran dihêrim
Dixwazim şeng û şadî
Li cîhanê bigerin

Em Kurdin Kurdin Kurdin
Xemil û rewşa çiyane
Roja cengê bi dengin
Tim ser bilind xuyane
Ji bona cejn û jînê
Xweş destar û peyane
Tev karker û cotkarin
Him padîşah û mîrin
Bi kar û îş û barin
Nadir û bê nezîrim
Ceng û şera digêrim
Berzanîne seraser
Rengê şêra dinêrin
Zêr û yaqût û gewher
Em Kurdin Kurdin Kurdin
Xemil û rewşa çiyane

## ŞÎ N Û XEBAT

Hero diçê bişînê
        Himbeze qîr û fîxan
Naçî dorî avînê
        Li xwe pêçaye buryan
Xuyanî kir ji nîne
        Dimînî tim perîşan
Qet naxwazim bi tûtûk
        Ramûsê hêvîyê min
Find û çinara pepûk
        Ber nadê ser cîhê min
Şîn û xebat û pertûk
        Sara şew qe destê min
Herdem bi kêferate
        Serkoşkên mizgînê
Di dil de bobelate
        Qencî çira nabîne
Li kû jî nû felate
        Dadî li kû dimîne

## XEMLA DÎLBER

Dîlber şêrîne
Dû çav kildane
Şewq û sura wê
Dû lêvên yarê
Dû demên yarê
Ji ber bîna wê
Şewq û sura wê
Nazdar û naze
Seyran û geşte
Newal û deşte
Xemla sarişta
Hevrazê jorî
Sersal û cejne

Bi xeml û zîne
Kes wek wê nîne
Xweşî û vîne
Jê hingivîne
Gula Yasemîne
Rihan çemîne
Hêyv û perwîne
Pirnazelîne
Buhar û şîne
Koh û zevîne
Tevtê civîne
Jê reng zêrîne
Jîyan û jîne

# FIHREST


| | |
|---|---|
| Zor destan dihêrim | 3 |
| Şêrîne welatê min | 4 |
| Aştî | 5 |
| Para me xoze | 10 |
| Nalîna | 12 |
| Serhindan | 14 |
| Nama milet | 16 |
| Şerê xwînxwar | 17 |
| Welatê min melûle | 18 |
| Kengî | 19 |
| Ji bizava yartê afirandin | 20 |
| Xurtiya yekîtiyê | 23 |
| Hêvî û avrû | 25 |
| Şêrîne min | 26 |
| Ji xew rabe | 27 |
| Çiraya çakiyê meste | 29 |
| Dîlan û sema | 31 |
| Rewşa zaroyê dehbê | 33 |
| Êrîşa xedar | 35 |
| Cejna jînê | 37 |
| Namek ji xain re | 39 |

| | |
|---|---|
| Xwedyê aş bûye qeraş | 41 |
| Dubendî ûhêvîya koledare | 43 |
| Faşist nama | 45 |
| Pêlang | 48 |
| Listoka şerxwaza | 49 |
| Rihê min ber şewate | 51 |
| Pepûkiya min dijmindiçerînê | 52 |
| Lêvê rizgariyê dermane | 53 |
| Mizgînê razî nekê nabê | 54 |
| Sorgula geş | 56 |
| Şina Halebce | 57 |
| Zinara Arebî | 61 |
| Rewşa hêlekê ji Kurdistan | 63 |
| Ax û hewar | 69 |
| Jiyana nexweş me navê | 71 |
| Xerîbî û rengê jiyana min | 73 |
| Baxe min bu xar | 75 |
| Jina ala min | 77 |
| Destûra xoz | 79 |
| Em Kurdin | 80 |
| Xemla dîlber | 83 |
| Fihrest | 85 |

